Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîh

Bê Bextî ya Yehudaî

U cejina Nanê Şikeva nêzîk bî yaku dibêjinê Cejina Derbazbînê. U hêşta serukêt qeşa u mamostayêt desturî hewil didan ‘Îsaî bikujin çunku tirsa wan ji milletî bî. Iblîs çû dinav leşê Yehudaî da, yê ku digûtinê “Esxerîutî” u yê ku êk bî ji dwazde şagirda. Yehuda çû u digel serukêt qeşa u pasewanêt peristgehê axivit ka dê çawa ‘Îsaî dite destê wana. Îna keyfa wan hat u birrîar dan hindek para bidinê. Ew jî razî bî bi wê çendê u berê xu dida delîvekê da ku ‘Îsa dûrî xelkî bidite destê wan.

Şîva Dumahîkê

U Roja Derbazbînê hat yaku divîan berxê Derbazbînê têda ser jê kin. Îna Petrus u Yuḧenna virêkirin u gut, “Herrin u bu me xwarina Derbazbînê amade bikin daku em bixwîn.” Pisîar jê kirin, “Te divêt em li kîrê amade bikîn?” Wî gute wan, “Demê hîn diçine nav bajêrrî, dê miruvekî cerê avê li ser milî bînin, hîn bigehinê heta mala diçitê, hîn bêjine xudanê wê malê, <Bêjite te jura mêhvana li kîve ye yaku ez Şîva Derbazbînê digel şagirdêt xu têda bixwin?> Ew dê jurekê li texa dûê nîşa we dit, jureka mezine u raêxstî ye. Hîn dê li wêrê amade kin.” Ew derketin u çûn u ew tişt dîtin yê ‘Îsaî guti ye wan. U nanê Derbazbînê amade kirin.



Demê bî ye wexit, ew u hinartî digel êk rînîştin u gute wan, “Dilê min gelek diçûyê ez vê cejina Derbazbînê digel we bixwim berî ez bême êşandin. Ez dibêjime we, çunku ez êdî naxwim heta paşayetî ya Xwidê bi cih ne êt.” U perdaẍek şerabê helgirt u supasîa Xwidê kir u gut, “Vê perdaẍê bigirin u dinavbera xu da parvekin. Çunku ez dibêjime we êdî ez ji berhemê dara tirî naxwim heta paşayetî ya Xwidê ne êtin.” U nan helgirt u supasîa Xwidê kir, şikand u da wan u gut, “Eve leşê min e yê ku diber we da diête dan. Hîn vê ji ber bîrhatina min bikin.” U herwesa perdaẍ pištî şîvê helgirt u gut, “Ev perdaẍe peymana nî ye bi xwîna min yaku ji ber we diête riştin. U li ser sifirê destê wî kesî digel min e ewê min bidit destê neyara. U divêt Kurrê Miruv bi wî rengî biçit yê ku bu hati ye danan. Belê mixabinîa wî kesî yê wî bidite destê neyara.” Îna pirsîara êk u dû kirin: tu bêjî kî ji wane vê çendê bikit.

U paşî weku hercar çû Çîayê Zeytûn u şagirdêt wî bi dîv ketin. U demê gehiştînê, gute wan, “Nivêja bikin daku hîn ne kevine di taqîkirna da.” U nêzîkî dîratîa ber havêjekî ji wan dîr ket u çukêt xu danan u nivêj kir u gut, “Ey Babû, heker çê bit tu vê perdaẍê ji min dîr bêxe. Belê bila ḧeza te bit, ne ḧeza min.” U firîşteyek ji esmana lê der ket u peyt kir. Li vêrê ‘Îsaî milmilanê dikir u bi

germî nivêj dikir, xuhdana wî weku xwînê dikete erdî. U paşî nivêj berda u hate def şagirda, berê xu dayê ji xema nivistîn. Îna gute wan, “We çi ye, hîn nivistîn? Rabin nivêja bikin, da hîn ne kevine di taqîkirin.”

Girtina ‘Îsaî

Demê hêş diaxivit, revdeka miruva hat u yê ku dibêjinê Yehuda li pêşîa wan bî. Ew jî êk ji wan dwazde şagirdan bî. Îna bi pêş ‘Îsaî ve hat daku maçî bikit.

“Jîn” guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom
© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.



‘Îsaî gutê, “Ey Yehuda, tu bi maçê Kurrê Miruv didî destê neyara?” Demê şagirdêt ‘Îsaî zanîn dê çi rîdit, gutin, “Ey Xudan, em şîrî veweşînîn?” U êk ji wan şîr veweşand kuîlê serukê qeşa u guhê wî yê rastê birrî. ‘Îsaî gut, “Li vê çendê rawestin.” U dest havête guhê wî u sax kir. U ‘Îsaî gut serukêt qeşa u pasewanêt peristgehî u rihspîa, ewêt ku hatînê, “Erê hîn min weku dizekî dibînin, hîn husa bi dar u şîrve hatîne min? Demê ez her ro li peristgehê li def we, we destê xu drêjî min ne kir. Belê eve delîva we ye u desthelatîa vê gavê bu tarîê ye.”

‘Îsa girtin u birin heta krîne dikuçka u serukê qeşa ve. U ew zelamêt zîrevanî li ‘Îsaî dikirin, tirane pê dikirin u lê didan. U rîê wî dinxamitin u pisîar jê dikirin, “Pêxemberatîê bike, kî bî li te daî?” U gelek axftinêt kirêt digutinê.

U demê roj derketî, civata rihspîêt milletî kumbîn, yaku ji serukêt qeşa u mamostayêt desturî pêkhatî. U birin pêşîa civata xu u gutin, “Heker tu Mesîḣ bî, bêje me.” Îna gute wan, “Heker ez bêjime we hîn bawer ji min nakin, u heker ez pisîarê ji we bikim, hîn bersiva min nadin. Belê Kurrê Miruv ji nuke pêve dê li destê rastê yê şîana Xwidê rînîştî bit.” Îna hemîa gutin, “Anku tu Kurrê Xwidê î?” ‘Îsaî gute wan, “Ewê we gutî ez ew im.” Îna gutin, “Ma me çi pêdivî bi şahda heye? Eve me ji devê wî bi xu guh lê bî.”

Birina ‘Îsaî def Pîlatisî

U paşî civata wan hemî rabîn u ‘Îsa birine def Pîlatisî. U dest bi gunnehbarkirna wî kirin u gutin,



“Bu me dîar bî eve milletê me di serda dibit u nahêlit xuêk bu qeyserî bête danê. U dibêjit ez Mesîḣê paşa me.” Îna Pîlatisî pisîar jê kir, “Tu î paşayê Cihîa?” ‘Îsaî bersiva wî da, “Te bi xu gut.” Paşî Pîlatisî gute serukêt qeşa u civata li wêrê, “Ez çi gunneha ji vî miruvî nabînim.” Belê wan gunnehbartir kirin u gutin, “Ew milletê li hemî Yehudîê hand dit, her ji Celîl u heta vêrê xelkê fêr dikit.”

Dadkirna ‘Îsaî bi Mirnê

Pîlatisî daxwaza serukêt qeşa u seruka u milletî kir u gute wan, “We ev miruve îna ye def min ku milletî di serda dibit, u rêkê li wan berze dikit. Piştî min di ḣazirbîna we da baş berê xu dayê, bu min dîar bî ku çi gunneha vî miruvî nîne ku hîn gunnehbar dikin. Vêca ewî çi tiştê wesa ne kirî ye ku hejî mirnê bit. Ez dê qamcî dim u dê ber dim.”

Belê hemîa gazî kir, “Evî bikuje u bu me Barabasî ber de!” U ev Barabase ji ber têkve dan li bajêrrê u kuştinê hat bî zîndan kirin. Dûbare Pîlatisî gut u divîa ‘Îsaî azad bikit. Ewan pêk ve kirin gazî, “Xaç bide! xaç bide!” Îna cara sîê Pisîara wan kir, “Vî çi gunneh kir ye? Ez çi gunneha wî nabînim ku hejî mirnê bit. Vêca ez dê qamçî dim u azad kim.” Belê ewan bi tundî u bi dengekê bilind gazî kirin u xwastina xaçdana wî kirin. U dengê wan bi ser dengê wî kit. U Pîlatisî ferman da u daxwaza wan bi cih îna. U ewê li ser têkvedan u kuştinê hatî girtin, li ser daxwaza wan azad kir. Belê ‘Îsa êxiste jêr birîara wan.

‘Îsa li ser Xaçê

Demê ewan ‘Îsa bu xaçdanê dibirin zelamek xelkê Qeyrewanê girtin, di gutinê Sim’an, ew zelame ji çemî vedigerîa u xaç danan ser milêt wî daku li dîv ‘Îsaî helgirt. U gelek xelk ketbîne dîv wan digel hindek jina bu digirîn u li xu didan. Îna ‘Îsa li wan zivirrî u gut, “Ey kiçêt Urşelîmê, bu min ne girîn, belê bi xu u biçîkêt xu bigirîn. Ha dê hindek roj ên xelk dê bêjin: xinêka jinêt bê ber ewêt bi tişt ne ketîn u singêt wana şîr ne daî ne kesê. Hingê dê bêjine çîa bi ser me da bi herfin u bêjine gira me bi nixêmin. Vêca heker husa bi çeqê kesik vekin, pa dê xalê çeqê hişkê çawa bit?”

U dû gunnehbar jî digel ‘Îsaî bu

© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

xaçkirnê birin. U demî gehiştîne wî cihê dibêjinê Kilux, ew digel dû gunnehbara xaç dan. Êk ji wan li ser destê wî yê rastê u yê dî li destê çepê. U 'Îsaî gut, "Ey Babê min, li wan bibure çunku ew nizanin ka çi dikin." U cilkêt wî bi pişkê li xu li kîve kirin. U millet li wêrê rawesta bî u berê xu didanê u her wesa seruka deqiş lê didan u digutin, "Xelk qurtal kirin, dê bila xu qurtal bikit heker rast Mesîḧê li def Xwidê hilbijartî ye." U her wesa serbaza jî tirane pê dikirin. U sihik pêşkêş dikirin u digutin, "Heker tu paşayê Cihîa î, xu qurtal bike." U parçe depek li ser serê wî helawîst bîn, u ev çende li ser nivîsî bî, "Eve ye paşayê Cihîa".

U êk ji wan her dû gunnehbara axiftinêt ne drêda gutinê, u gut, "Ma tu ne Mesîḧ î? Pa dê xu u me jî qurtal bike." Belê yê dî paşvebir u gutê, "Tu di wî ka u danî da u ji Xwidê natirsî? Hindî sizayê me ye, sizayekî rast e. Çunku em yê sizayê kirîara xu bi rastî distînin. Belê vî miruvî çi tiştê ne di cihê Xuda ne kirî ye." U paşî gut, "Ey 'Îsa, min bîne bîra xu demê tu diçî ye paşayetîa xu da." 'Îsaî gutê, "Bi rastî ez dibêjime te, tu dê evru digel min li fîrdewsê bî."

Mirna 'Îsaî

U nêzîkî se'et şeş (dwazdeî nîvro) u heta se'et neh (sîê piştî nîvro) tarî kete hemî erdî, u tav reş bî u perda peristgehê di nîvêra ker bî. 'Îsaî bi dengekî bilind gazî kir, "Ey Babê min, ez ruḧa xu didime destê te." U piştî we gutî ruḧ ji dest da.



U demê serpelî ev tişte dîtî, pesna Xwidê kir u gut, "Bi rastî eve miruvê henê yê rast bî." U her wesa ew kesêt hatî ne xaçdanê bibînin, demê ew tişte dîtîn, danane singêt xu. Belê hemî nîasêt wî u digel wan jina ewêt ji celîk digel hatîn. Ji dîr ve rawesta bîn u berê xu di daneser u berê xaçdanê.

Veşartina 'Îsaî

U miruvek ji civata rihspîêt milletî hebî, navê wî Yusiv bî, miruvekê baş u rast bî. Ew digel birrîara civatê u kirîara wan ne bî. Ev miruve ji xelkê bajêrrê Cihîa Ramê bî. U ew jî êk ji wan kesa bî yêt çaverrêîa paşayetî ya Xwidê dikirin. Ev miruve çû def Pîlatisî u termê 'Îsaî jê xwast. U paşî ji xaçê îna xwarê u kitan lê aland u ber gurrê di textê da kulaî da veşart, ew gure kesek têda ne hat bî veşartin. Ew roje roja amadekirna Roja Şembîê bî, ya ku nêzîk dibî u ew jinêt ji Celîl digel 'Îsaî hatîn, ketine dîv Yusivî u gur u seruberê veşartina wî dîtin. U paşî vegerane ve, u dermanêt bêhin xuşîê u çewirkinê amadekirin. U Roja Şembîê li dîv desturî bêhina xu vedan.

Saxbîna 'Îsaî

Roja êkê ji ḧeftîê, hêşta zî ew jinik çûne ser gurrê u derman u bêhina xuş ya ku ji berî hingê amadekirîn, digel xu birin. Berê xu danê ew berê di derê gurrê da yê hatî ye girêlkirin, belê demê çûne jur, termê 'Îsayê Xudan ne dîtin. U guhişî man, u di wî demî da berê xu danê dû zelam bi cilêt çirsî ve li tenişt wan dirawestaî ne. U tirsê ew girtin u berê xu dane ber pêt xu, îna her dû zelam gute wan, "Hîn



buçî li nav mirîa li saxa digerrin? Ew ne li vêrê ye, belê yê rabî! Bînine bîra xu demê hêş li Celîl gutî ye we gut bî: Divêt Kurrê Miruv bi destê hindeka bikevite destê gunnehkara, u bêt xaçdan u roja sîê rabit. Axiftina wî hate bîra wan u ji ser gurrê vegerrane ve u ew hemî dengubase bê kêmatî gehandine her yazde şagirda u xelkê dî. U ew jinêt ew dengubase gehandî ne hinartîa eve bîn: Merîema Mecdelî u Yunna u Merîema deyka Ye'qubî bîn, u digel hindek jinêt dî ewêt digel wan çûîn. Belê axiftina wan li def hinartîa weku axiftina miruvekê bê huş bî bawerî bi wan ne îna. Belê Petrusî kire ẍar u çû ser gurrê. U demê xu çemandî ye hindav gurrê. Bi tinê patêt pêçaî dîtin u ji wê rîdanê guhişî ma u çû.

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom
© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

Di Rêka ‘Imuas da

U her wê rojê dû şagird diçûne gundekê, dibêjinê ‘Imuas, ev gunde nêzîkî ḧeft mîla ji Urşelîmê dîr bî. U li ser hemî rîdanêt peyda bîn diaxiftin. U demê ew diaxiftin u dan u standin dikirin, ‘Îsa nêzîkî wan bî u digel wan bi rê çû. Belê çavêt wan hatine perde kirin u ne nîasîn. U pisîar ji wan kir, “Hîn diçûna xu da liser çi diaxivin?” Îna rawestan u mirîtu bîn, u êk ji wan bersiv da, navê wî Kilîubas bî, u gutê, “Erê, ma tu bi tinê li Urşelîmê bîanî u tu nizanî ka li Urşelîmê çi rîda ye?” Îna gut, “Çi çê bî ye?” “Gutin ewa bi serê ‘Îsayê Nasirî hatî ew pêẍemberê beramberî Xwidê u hemî milletî yê desthel u çawa serukêt qeşa u karbedestêt me ji nav birin u xaçdan. Belê hîvîa me ew bî u me hizir dikir, ku ew dê Îsraîlê rizgar kit, belê eve sê roje hatî ye xaçdan. Belê hindek jina emêt guhişandîn, ev jine hêş spêdê zî çûne ser gurrê u termê wî ne dîtin u vegerrane ve u gutine me dû frîşte dîtin dibêjin ‘Îsa yê sax e. U hindek ji ewêt digel me çûn u dîtin ew rast dibêjin, belê ew bi xu ne dît.” ‘Îsaî gute wan, “Ey tê ne gehiştînû. Hîn evêt bawerîa we bi hemî gutinêt pêẍembera kêm: Ma ne divîa Mesîḧ wa hemî nexuşîa bibînit u paşî biçit u bi gehite mezinatî ya xu?” U paşî bu wan hemî ruhinkir, her ji Musaî u hemî pêẍembera bigire u ka çi beḧsê wî di hemî kitêba da hatîye kirin.

U paşî nêzîkî wî gundî bîn, ew gundê her dû şagirda divîa biçinê, belê ‘Îsaî ji xu gute wan ez dê çime erdekî dîrtir. Belê wan hîvî jê kirin u gutinê bimîne def me her wexte roj dê avabit, u êvar nêzîk bî. ‘Îsa digel wan çû jur. U demê digel wan palqedaî, dest havête nanî u pîruz kir u şikand u da wan. Hingê çavêt wan vebîn u naskirin u paşî berze bî. Êk ji wan digute yê dî, “Ma ne dilê me di singê me da disut demê di rêkê da digel me diaxivit u bu me pertukêt pîruz ruhin dikirin?” U paşî herhingê rabîn u vegerrhan Urşelîmê u her yazde u digel yêt dî dîtin yêt kubîn, u digutin, “Rast e Xudanê rabî u yê xu nîşa Sim’anî daî!” U ew çenda di rêkê da rîdaî u çawa naskirin demê nan şikandî gehandî ne wan.

‘Îsa Xu Nîşa Şagirdêt xu Didit

Demê herdûka beḧsê hindê dikir, ‘Îsa bi xu di navbera wan da rawesta u gutê, “Aştî bu we bit! Belê ji tirsanda li def wan ew bî yê reşekê dibînin. U gute wan, “We çi ye, hîn têkçûn? U buçî hîn ne reḧet in? Berê xu bidin dest u pêt min, ez bi xu me, dest bikine min u rastîê bizanin. Hindî reşe çi goşt u hestî nîne weku hîn dibînin.” Demê ew çend gutî, dest u pêt xu nîşa wan da. Ewan hêşta ji keyf u guhişînê bawer ne dikir. Gute wan, “We li vêrê tiştekê xwarnê heye?” Îna kerekê masîa birajtî danê u li ber çavêt wan wergirt u xwar. U paşî gutê, “Eve ew gutine ya ku hêş ez dinav we da min gutî ye we ku divêt çi tiştê di desturê Musaî u pertukêt pêẍembera u li ser min hatî nivîsîn bi cih bêt. U paşî bîr u hişêt wan vekirin daku di pertukêt pîruz bigehin. U gute wan, “Husa ya hatî ye nivîsîn u husa divîa Mesîḧ bêtin êşandin u roja sîê ji nav mirîa rabit. U bi navê wî ragehandina peşêmanî u lêburîna gunneha li hemî milleta bête kirin ku ji Urşelîmê dest pê bikitin. U bibine şahdin li ser van kar u bara. Eve ez dê wî tiştê babê min suz pê daî bu we hinêrim, belê li bajêrrî bimînin heta hîn ji banê bilind ji hêzê bi çil bikevin.”

Çûna ‘Îsayê Mesîḧ bu Esmana

U paşî birne Bêt’înê ji derveî bajêrrî, u destêt xu bilind kirin u ew pîruz kirin. Demê ew pîruz

dikirin, ji wan veqeta u bu esmana hate bilind kirin. U paşî ‘Îsa peristin u bi keyfek mezin vegerrhane ve Urşelîmê, u berdewam diçûne peristgehê u pesina Xwidê dikir.

- Mizgînîa Luqaî 22:1-23, 39-54, 63-71; 23:1-5, 13-16, 18-56; 24:1-53

“Jîn” guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom
© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.